

Dumahîk : Dadweriya ...

bi destên xwe kurî xwe bikuje?!... Ez bawerim tu bê guneh î, lê, tiliyên gûmanê bal bi te ve jî hene, giringe tu wan gûmanan ji xwe dûr bikî.” Ewê pirsî:” Ez çi bikim aqilmendê hêja?”. Aqilmend lê vegerand û got:” Keça min, hema rabe ser xwe, delingê xwe bêxe, dawa xwe hilde , berê xwe bide civata zilaman û bêje: Bi Xwedê min kurê xwe ne kuştiye, yekser tê herî mala xwe!!.” Ewê, bi girîn, bi kul û kesereke kûr lê vegerand û got:

“Ma ez pepûk û porkura Xwedê, çawa li pêş vê civatê xwe berdime der, ma qey ne şerme, hetîketî ye apo?! Bera xwîna kurê min jî têkeve stuyê min û tucarî ez vî karî nebûyî nakim!!..”. Aqilmend gazî hewiya wê kir û jê re got:”Keça min, bawerî li nik min çê bûye ku diya lêwik ew bi destên xwe fetisandiye û tu bê guneh î...!!Lê, tu bikî nekî, tilî bi ser te ve jî diçin, ji bo ez biryara xwe bidim, divê tu van gûmanan ji xwe dûr bikî.” Hewiyê lê vegerand go: Ma ez çi bikim?. Aqilmend jê re got:”Hema rabe ser xwe, delingê xwe bêxe, dawa xwe hilde, berê xwe bide civata zilaman û bêje: Bi Xwedê min kurê hewiya xwe ne kuştiye.”. Jinikê, yek ne kir dido, go: Bera ez benî. Rabû, xwe daqûl kir da-delingê xwe bêxe û...Aqilmend bi zirt bang lê kir û got: “Hey bê şerm a bê fihêt, tê çi bikî?.Tu kujer î!!..”.

Kurê wî, yê ku bûyer bi çavên serê xwe dîtibû, destûra axaftinê ji bavê xwe xwest û ji civatê re got:”Belê bavo, biryara te rast e, ji ber ku min bi xwe dît bê çawa vê jinika bê ol, kurikê hewiya xwe kuşt, derziya dirûnê di xavika serê wî de çikand!!”. Çû derzî ji serê lêwik derxist û li ber civatê danî!! Hewiya jinikê jî li kiryara xwe mikur hat û di civakê de rûreş û riswa bû!!.

Şam- 15ê Nîsana 2009Z-2621K

Hin çalakiyên rêxistina Heleb a P.Y.D.K.S

• Li heyva Nîsanê rêxistina xwendekarên zanîgeha Heleb a P.Y.D.K.S hin seyranên bi çûk, di hembêza sirûsta rengîn de, tevî dost û hevalan li dar xistin. Ew seyran li ber sazê tembûr û dirbeka, bi stranên folklorî, çepik û lîliyan, bi kêf şahî bi dawî bûn.


• Li 12-04-2009 an, rêxistina xwendekarên zanîgeha Heleb a P.Y.D.K.S, şevê di bin navnîşana pirsgirêka têkliyên di navbera xort û keçên Kurd, di zanîgeha Heleb de, bi beşdariya dora 30 xort û keçî li dar xist.. Rêvebiriya şevê bi şewekî diyalgî, di çarçewa wê navîşanê de bir serî.

• Bi boneya roja rojnemegiriya Kurdî, komîta rêvebiriya rojnama YEKÎTÎ û NEWROZê, du şevên bîranînê li dar xistin. Herdu bi beşdariya dost û hevalan, li ser girîngiya ragiyandin û rojnemegiriyê di jiyana gelan de û bi taybetî di jiyana gelê Kurd de, hate rawestandî û herweha bi gelek pirs û bersivan ew şev xemilîn.

• Li 5î heyva Nîsanê jî şevê di bin navnîşana pirsgirêka têkliyên di navbera siyaset û rewşenbîriyê de hate li dar xistin. Li wê şevê dora 20 kesên karê rêzanî û rewşenbîriyê dikin beşdar bûn. Rêvebirê şevê bi şewekî akadimîk şeva xwe domand.

Cejna Çarşema Şor Pîroz Be

Bi boneya hatina Cejna sersala Êzîdiyên Kurd, hêviya me ew e ku, ev cejna olî ya resen bibe bingeh ji lihevhatina hemî baweriyên milletê me re.



Dilê Kurdên me yên bi baweriya ola Êzîdî li gel birayên xwe di xêr û xweşiyê de bijîn.